Ji Penûsê Jinê Rastiye Jiyanê

RAPERÎN

Dîrok: Cotmeh 2022 Hejmar: 06

Berxwedana Jinê Wê Dagirkerî û Tundiyê Têk Bibe

مقاومة المرآة ستهزم الاحتلال والعنف

بدأت المرأة الشيوعية الثورية هجومًا في ٢٥ نوفمبر ، اليوم العالمي للمرأة ، تحت شعار "مقاومة المرأة تهزم الاحتلال والعنف". الهجوم الذي بدأ في ١٧ أيلول على مدينتي قامشلو وكوباني ببيان صحفي. في نطاق الحملة ، لقاءات ، تثقيف ، توزيع منشورات ، مشاهدة أفلام عن العنف والنضال من أجل حرية المرأة ، كل ١٧ من الشهر في المدن مع بيانات صحفية. وعقدت فعاليات ولقاءات في مدن قامشلو وكوباني ودربيسية وحسكة في نطاق حملة JKŞ.

في قامشلو ، تم عقد بيان TKŞ أمام مؤسسة TKŞ. قرأت مزكين خورشيد البيان نيابة عن JKŞ. ذكرت مزكين خورشيد في خطابها بأن الحروب الإمبريالية مستمرة في جميع أنحاء العالم والرأسمالية تنهب في كل مكان. كشفت مزكين خورشيد أن النساء والأطفال يعانون من أخطر عواقب هذه الحروب الإمبراطورية. مزكين خورشيد ، التي أشارت إلى اعتداءات الاحتلال على روج آفا ، قالت إنهن كنساء شيوعات يقاتلن ضد الرأسمالية وهيمنة الذكور تحت شعار "مقاومة المرأة تهزم الاحتلال والعنف". رحبت مزكين خورشيد بالانتفاضة التي قادتها النساء في شرق كردستان وأبلغت أن استهداف ناكيهان آكارسيل واستهداف القيادات من المرآة في روج آفا واستهداف المرآة، الكرد والشيوعات في الشمال هو رد فعل ضد حركة المرآة وفي نهاية البيان ألقيت شعارات "المرأة حياة ، حرة" "عاشت ثورة المرأة".

في كوباني ، عقدت المرآة الشيوعية ببيان صحفي بعد عرض فيلم ثريا أمام المركز في نطاق حملة JKŞ. باسم JKŞ ، قرأت بهار مصطفى بيانًا وأعلنت أن "القوات الإمبريالية مسؤولة عن الحرب الجارية". وتابعت بهار مصطفى في خطابها: هناك حاجة إلى حركة أقوى ، والقوى الإمبريالية تعمل في كل مكان من أجل مصالحها ، والمضطهدون لا مصلحة لهم في هذه الحروب". أقام أعضاء JKŞ عرضاً للفيلم في كوباني ودربيسي ضمن فعاليات الحملة. بعد عرض أفلام عن العنف ضد المرأة.

NÊRÎN 2 — Berxwedana Jinê Wê Tundî û Dagirkeriyê Têk Bibe

HEVPEYVÎN 3 — فادية سيدو: مقاومة المرأة ستهزم الاحتلال والعنف

ROJEV 4 — Têkoşîna Yekbûyî Û Xweparastinê Xurt Bikin

Tu Hêz Nikare Têkoşîna Jinan a Wekhevî û Azadiyê Bide Sekinandin

Berxwedana Jinê Wê Tundî û Dagirkeriyê Têk Bibe

Li Kurdistanê; Li Başûr, Bakur, Rojhilat û Rojava di têkoşîna azadî û wekheviyê de rola jinan diyarker e. Jinên ku mêtîngehên mêtîngehan in, li parçeyê Kurdistanê ya Rojava vîneke ku çarenûsa xwe biguherînin xistin holê. Bi şkenandina nîra mêtînger pergaleke şoreşger, demokratîk û pergaleke ji aliyê jinan ve avakirin. Şoreş pêvajoyeke ku ne temam bûye û berdewam dike. Ligel dorpêça kapîtalîst-emperyalîst, êrîşên dewleta Tirk ên dagirkirinê û hevbeşiya dewletên Sûrî û dewletên herêmê ya van êrîşan şoreşa Rojava dijî.

Dewletên emperyalî û mêtînger, li Rojhilata Navîn gel, netew û mezheb parçekirine, ji hev dûr xistin e. Şoreşa jinê ya Rojava, li Bakur û Rojhilatê Sûrî ji bo yekîtiya jinan gavên yekemîn avêt û di heman demê de pêşengtî ji têkoşîna yekbûyî ya gelan re kir. Yek ji wesfa şoreşa Rojava ya herî xurt ev e. Rastiya ku "têkoşîna jin di heman demê de têkoşîna azadiya civakî ye" di pratîka şoreşa Rojava de careke din hat dîtin.

Hedefgirtina jinan a dewleta Tirk a faşîst ne tesadûfî ye. Şoreşa me hîna ligel ku di destpêka rê de ye ji bo pergala serdest a zilam gefeke mezin e. Şoreşa me ya ku ji netewên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Turkmen û netew, ol û baweriyên din jin kir yek, wê rê nede êrîşên tunekirin û ji bo pêşketina şoreşê bi awayekî bibiryar û îsrar têkoşîna xwe di her astê de bide meşandin.

Li Rojhilata Navîn bi rêya ol, dewlet, eşîr û saziya malbatî kedxwerî û zexta li ser jinê hatiye kûrkirin. Hêrsdariya navbera pergala serdestiya zilam û jinan bitund e û potansiyela wê heye ku di her kêliyê de biteqe.

Li Îranê li dijî pergala kapîtalîst a baviksalarî ya ku ketiya karektera rejîma Melelî tevgera gel ku bi pêşengtiya jinan berdewam dike ev careke din nîşan da. Jina ciwan a Kurd ku bi navê Jîna Emînî di 13'ê Îlonê de li Tahranê ji aliyê polîsên exlaqê ve hat binçavkirin û bi şkenceyan hat qetilkirin. Li dijî vê jin bi biryardariyeke mezin derketin kolanan. Jinan bi bedêla hatin îdamkirin, heps û şkenceyan li dijî rejîma Melelî fîtleya tevgera serhildanê vêxist.

Li Bajarên weke Şîraz, Esfehan, Reşîd, Tewrêz, Zencan, Yezîd, Diwandere, Seqîz, Merîwan, Mahabat û Dêwlan çalakî bênavber berdewam dikin. Ligel ku bi hezaran çalakvan hatine binçavkirin û bi dehan ji wan hatine qetilkirin jin, ciwan û gel ji kolanan venakişin.

Daxwaza azadiya zayendî ya jinan bi daxwaza azadiya polîtîk a karker û kedkaran ve bûye yek. Ev tevgera jinan û gel a li Îranê nîşan da ku bingeha madî ya civakî ya şoreşê amade ye. Gûncawbûna şoreşa jinê careke din nîşan da.

Li dijî dewleta Tirk a mêtînger li Bakurê Kurdistanê têkoşîna jinan bi bedelên mezin berdewam e. Di şertên îmha û înkara netewî de, Kedxweriya beden û kedê û serdestiya zilam a li ser jinê zêde dibe. Êrîşên li ser deskeftinên ku bi bedelên mezin hatine bi dest xistin bênavber berdewam dikin. Bi sedan jinên pêşeng tên qetilkirin, tên xistin zindanan û rastî şkenceyan tên, lê vîna wan nayê radestgirtin. Hêza yekbûyî ya têkoşîna jinên Kurd û jinên Tirkiyê ji bo dewleta Tirk a mêtînger dibe tirseke mezin.

Li bajarên Başûrê Kurdistanê hîna têkoşîna azadiya jin lawaz e, lê di nav de dînamîkek pêşveçûnê heye. Êrîşa namerdane ya li dijî Nagîhan Akarsel li Başûr êrîşeke li dijî dînamîka ronîbûna jinê ye. Ev êrîş hamleya rê li ber girtina têkoşîna azadiya jinê ye. Hêrs û tevgera ku piştî qetilkirina Nagîhan Akarsel di vê wateyê de girîng e.

Jin li çar parçeyê Kurdistanê, li çiyayên Kurdistanê pêşengtiya avakirina yekîtiya netewî dikin. di heman demê de jinên ji netew û baweriyên cûda di bingeha têkoşîna wekhevî û azadiyê de, rêhevaltiya jin a herî pêşketî ava dikin. Li Zap, Metîna û Avaşînê her bostek axên ku tên parastin mewziyê jinan ê yekîtî, wekhevî û azadiyê ye.

Ji Amedê heta Dersîmê, ji Mersînê heta Serhadê, Ji Kobanê heta Minbicê jinên Kurd sînorên ku emperyalîstan weke xencerekê xistiye navbera me derbaskirin û ev sînor şandin çopgeha dîrokê. Jin li çar parçeyên Kurdistanê bûn ala yekîtî û şoreşa herêmî.

Têkoşîna azadiya jinan, qasî ku têkoşîna azadiya jinan e, ew qas jî têkoşîna azadiya tevahî beşên bindest e. Ji ber wê jin qasî ku ji bo zayenda xwe şer dikin, ew qas jî ji bo azadiya civakî jî şer dikin. Li dijî çînên kedxwer û hevkarên wan têkoşîneke lihevneker didin meşandin.

Şoreşa jinê ya Rojava xwedî rola hêza mîtorê ya şoreşa çar parçeyê Kurdistan û herêmê ye. Têkoşîna şoreşa Rojava ya Jin a li dijî dagirkeriyê, mêtîngêriyê di heman demê de berpirsiyartiyeke li dijî gelên bindest e. Li dijî serdestiya zilam a paşverû pêşxistin û parastina nirxên azadiya jin ên şoreşê ji bo jinên çar parçeyê Kurdistan û jinên tevahî Rojhilata Navîn erka me ye.

Têkoşîna sê xwişkên Mîrabel ên ku di têkoşîna li dijî Dikdatoriya faşîst a Turujîlo de bûn nemir wê di têkoşîna me ya şoreşa jin a sedsala 21'emîn de jiyan bike. 25'ê Mijdarê ne rojekê şînê ye. Vê rojê weke rojeke ku em ji her cure pergala serdestiya zilam a şexsî û rêxistinkirî hesap bixwazin di dîroka me de cihê girt. Me ji şopdarên Dikdatoriya faşîst a Turujîlo hesap xwest û em ê pirsîna hesap berdewam bikin.

Em ê têkoşîna Sara, Sarya, Arîn, Jiyan, Zeynep, Mizgîn, Jin Rojhilat, Nagîhan, Sara, Rûken û Hevrînan mezin bikin, ji bo jinên herêm û cîhanê bi serkeftinê tacîdar bikin. Em ê li dijî pergala baviksalarî ya serdestiya zilam, li dijî mêtîngêrî û dagirkeriyê têkoşîna xwe hîna mezintir bikin. Em ê li dijî êrîşên her cure ax, ked û bedena xwe têkoşîna xwe bilind bikin. Em bi vê bergeh û erkên xwe 25'ê Mijdarê bi awayekî xurt birêxistin bikin, li dijî tundiya serdestiya zilam 25'ê Mijdarê vegerînin hamleyekê.

فادية سيدو: مقاومة المرأة ستهزم الاحتلال والعنف

شنت النساء الشيوعيات الثوريات (JKŞ) إضرابا على مستوى أنشطتهن في ستمبر. تستمر حملة "مقاومة المرأة ستهزم الاحتلال والعنف" في مدن روج أفا وشمال سوريا حتى ٢٥ تشرين الثاني / نوفمبر ، "اليوم العالمي لمناهضة العنف ضد المرأة". أجابت المتحدثة باسم JKŞ فاديا سيدو على أسئلتنا حول هذه الخطوة ونضال النساء ضد هيمنة الذكور.

انتم كنساء شيوعيات ثوريات JKŞ لديكم حملة ماهو هدف هذه الحملة ؟

وكيف تقومو بهذا العمل ؟٤٤. في البداية : شعارنا "بمقاومة المراة سنهزم العنف والاحتلال " نحنا كألمراة الشيوعية الثورية JKŞ نظمنا حملة لثلاث اشهر كل ١٧ الشهر نقوم بقراءة بيان ولدينا ايضا طباعة جريدة رابرين وتوزيعها وتوجد ايضا دورات في مجالسنا هي عن العنف والمراة - الاحتلال ونضال المراة وايضا مشاهدة فلم عن مقاومة النساء وربورتاج مع نساء المجالس عن الاحداث والجرائم التي تقوم بها دول الاحتلال بقتل النساء والبيان الاول دارا عن من ناحية تدور حروب الانقسام بين القوى الامبريالية والراسمالية من ناحية اخرى يتم تدمير هوية النساء . من الضروري ان تنظم النساء وتقاتل من أجل الشيوعية هي النضال من اجل النساء. الشيوعية هي بلد الحرية والمساواه للمراة والبيان الثاني عن استهداف النساء مثل ناكهان اكارسال وجينا اميني والبيان الثالث عن مناهضة العنف ضد المراة والهجوم على ارادة المراة هدفنا من هذه الحملة لتخلص والقضاء على الذهنية الذكورية وان تدافع المراة عن قيمها وحق الرأي في المجتمع وبناء حياة حرة لجميع النساء ولتخلص من كل اساليب العنف. سنقاوم ونناضل ونكافح. ونكون يد واحدة وصوت واحد.

انتم ك JKŞ كيف تقيمه الهجومات على ثورة روج أفا وثورة المرأة ؟

تشن الدولة التركيا المحتلة منذ عام ٢٠٢١ وحتى الان هجماتها بالطائرات المسيرة تضع مسيرات الاحتلال من قبل اردوغان وشركات العائلة وقتل حتى الان مئات المواطنين في باشور وباكور وروج أفا ولهجمات هذه الطائرات ومن دون شك الدولة التركية تنفذ هذه الهجمات بموافقة القوى الدولية التي تسيطر على المجال الجوي لمناطق شمال وشرق سوريا كما أن الدول الاوربية شريكة في هذه المجازر بيبعها قطع السلاح ويتم استهداف النساء اللواتي حاربن داعش من قبل اصحاب داعش تقوم الدولة التركيا المحتلة اليوم بأتمام العمل الذي لم تستطيع داعش اتمامه بطائراتها المسيرة ليست هذه المرة الاولى التي يتم فيها استهداف النساء المناضلات من قبل المحتلين بعد هزيمة داعش اصبحت النساء القياديات اولى أهداف الاحتلال التركي النساء اللواتي لعبن دوراً في بناء ثورة روج افا وبذلن جهداً كبيراً فيها استشهدن نتيجة هجمات طائرات مسيرة

الهجومات استهداف القياديات والناشطات وعلى جميع النساء والشعب ماهو بنظركم؟

.الهجومات والاستهدافات عمل جبان وفاشي الهجومات مستمرة من جهة الدول هجوم الاحتلال من جهة وخاصتنا على النساء . يتم استهداف النساء المناضلات والمقاومات اللواتي يعملنا من اجل حرية المراة اينما كان كونهن يعملنا على ايصال صوت المرأة والتعرف بجوهر وحقيقة المراة لكافة افراد المجتمع فالعدو يرى هذا الطريق هو الاقصر والامثل للوصول الى اهدافه والنيل من ارادة المراة وانكار وجود المراة المقاومة والمجتمع . وجرائم اغتيال الشهيدة جيان وزينب وناكهان مخططات مدروسة ومعدة مسبقاً اضحت ثورة روج أفا بقيادة المراة مثالاً لكل الثورات ضد الانظمة المستبدة في القرن الواحد والعشرين فالمكتسبات التي حققتها المراة في ثورة روج أفا اصبحت مثالاً لكل النساء في سوريا وخارجها .ان جريمة اغتيال عضوة مركز ابحاث جنولوجيا ناكهان اكارسال سبب لنا حزناً شديداً وكانت ضربة موجعة للحركان النسوية ولمركز جنولوجيا . والهجوم على اثنين من الرفيقات الشيوعيات وتعذيبهم على يد العصابات الفاشية التركية باشد انواع التعذيب وبعدها قتلو هذا العمل الجبان هو محاولة امحاء علم المراة ان التهديدات والهجمات على المنطقة هي استهداف للثورة ولمكتسبات المراة . لكن لتصدي هذه المؤامرات تعمل المؤسسات النسوية بأستمرار على التوعية عبر التدريبات الفكرية واطلاع النساء بشكل دائما على المستجدات السياسية.

في كردستان ايران مايقارب الشهر انتفاضة النساء قتلت امراة كردية باسم جينا اميني لأجل خصلة من شعرها ماذا تقولو عن هذه ؟

نساء ايران وبخاصة الفتيات والمراهقات في الاجيال الصاعدة يتواصلن مع بعضهن البعض ويشاهدن ويحصل في العالم الخارجي بواسطة الانترنيت فالشباب الايراني مطلع على تقدم المجتمعات المحيطة بأيران والدول الغربية على الاصعدة الاجتماعية والاقتصادية والفنية والحياتية ويشاهدن الفتيات العراقيات يشاركن في كردستان سوريا يقدن المجابهة ضد الارهاب والنساء في بيروت وتونس ومعظم المناطق الى الامام إلا في ايران وباتت المراة الايرانية تشعر بأن النظام يفتك بالشباب والرجال كلما عارضوه فقررت النزول الى الشارع لترجيح كفة الميزان لمصلحة التغيي انفجار انتفاضة نسائية عارمة في ايران بعد قتل الشابة جينا اميني شاركت الكثير من الفتيات الانتفاضة التي فجرت في ايران جينا اميني لم تموتي بل اصبحتي رمزاً اصبحت في انحاء ايران جميع يرددون هتافات "المراة حياة حرية " وهو شعار سبق ان ردده الاكراد في تركيا وسوريا واصبح الشعار الرئيسي في احتجاجات الايرانيين الاخيرة .من ميزات هذه الانتفاضة التي تقودها النساء في بعض الاقاليم انها اربكت النظام أكثر من سابقاتها واخذ يتخبط ولم يعرف طريقة للخروج من ازمة إلا بقتل . فالعدو يعلم أن لم تتحرر المراة لايمكن تحرير المجتمع . نحنا كنساء شيوعيات ثوريات نؤكد ان استهداف النساء المناضلات سيزيد من نضال المراة وانتقامنا من الذهنية الذكورية كما أن هذه الجرائم ستدفع بنا الى رفع وتيرة النضال حتى تحقيق النصر.

انتم ك JKŞ كيف تستقبلو يوم مناهضة العنف ضد المراة؟

مانقوم بها هو في البداية قراءة بيان عن العنف ضد المراة ضد نظام تروخيلو سجل هذا اليوم عن شجاعة النساء ومقاومتهن ضد تروخيلو الدكتاتوري نظام السلطة الذكورية التي لم تستسلم له اخوات ميرابيل الثلاث ارادو كسر ارادة المراة .سيستمر نضال اخوات ميرابيل الثلاث اللواتي خلدن في النضال ضد الدكتاتوري تروخيلو الفاشي ٢٥ نوفمبر هذا اليوم له مكان في تاريخنا هذا اليوم اصبح رمزاً لجميع النساء . نحنا كنساء شيوعيات ثوريات سنقف ضد كل اشكال واساليب العنف والتمييز.

نتائج المؤتمر العالمي الثالث للنساء

عقد المؤتمر العالمي الثالث للنساء في الأسبوع الأول من شهر سبتمبر. اجتمع ٩٢ مندوبا من ٤٢ دولة وأكثر من ٤٠٠ امرأة في هذا المؤتمر.

لفت المندوبون والمشاركون الذين قدموا من أمريكا وإفريقيا وآسيا والشرق الأوسط وأوروبا الانتباه إلى وضع النساء ونضالاتهن في بلدانهن. نقطة مشتركة على مستويات مختلفة وبطرق مختلفة ، من أمريكا اللاتينية إلى الشرق الأوسط ، كان هناك زيادة في الذكورة والتحيز الجنسي والعداء تجاه المرأة. هذا العداء هو زيادة ختان الإناث في إريتريا ، واضطهاد الحق في الإجهاض في بولندا.

وانضم مندوبون من تركيا وشمال كردستان وروج آفا / سوريا وفلسطين إلى دول الشرق الأوسط

في مؤتمر نساء العالم ، كانت المندوبات التي تحدثت ، المتحدثات والمنظمات والأحزاب السياسية ومتحدثات النساء اللواتي انضممن مقصورة بشكل عام على جداول أعمال قارتهن. لم يتم تقديم مشروع يخرج من البلاد وقارتها ويحدد الاحتياجات النظرية والأيديولوجية والسياسية للحركة النسائية في العالم ويستكشف ديناميات هذه التطورات.

في المؤتمر ، لم يجر المندوبون الأكراد مناقشة قوية حول القضايا الرئيسية للمؤتمر ، مثل الآلية المشتركة وعلاقاتهم ، وضرورة الحركة النسائية العالمية ومنظور المستقبل. قد تؤدي الجغرافيا التي جعلت ثورة المرأة ممكنة إلى نقاشات أقوى.

كان هناك هذا الوضع في مندوبي الشرق الأوسط الذين اعتبروا القارة والبلد ملكًا لهم. على سبيل المثال ، إحدى مندوبات فلسطين ، مريم أبو دقة ، التي كرست سنواتها لقضية تحرير فلسطين. لفتت هي والمندوبون الآخرون في خطاباتهم الانتباه إلى عواقب السياسة الصهيونية الإسرائيلية على شعب ونساء فلسطين والهجمات التي تحدث باستمرار. لقد عبروا بشكل مبرر عن توقعات النساء وطلبوا الدعم. لكن مع هذا التوقع للدعم الدولي ، لم يذكروا أبدًا دعم نساء روج آفا اللواتي يتعرضن لهجمات الغزو من قبل الدولة التركية كل يوم ، أو أسئلة الحركة النسائية في العالم.

كانت الأجندة الرئيسية لمندوبي كردستان خاصة حرب الدولة التركية في روجافا / شمال وشرق سوريا. في مواجهة هذه الهجمات ، تم التعبير عن الموقف الضروري للمؤتمر العالمي للمرأة من أجل حماية ثورة نساء روج آفا. كما ذكر أعضاء منظمة المرأة الشيوعية MLKP / الحاجة والأسباب لحماية الثورة النسائية في روجافا.

كان من بين الأنشطة الرئيسية للمؤتمر مناقشة بعنوان "ثورة المرأة وتجارب ثورة روجافا" التي عقدها الاتحاد النسائي الاشتراكي والجمعيات النسائية الاشتراكية في مؤتمر ستار بأكمله. وبمشاركة أكثر من ١٠٠ مشارك ، أصبحت المناقشة الأكثر شمولاً في المؤتمر. كانت مشاركة ممثلة المرأة الشيوعية الثورية في هذا العمل مقصودة ، لكنها لم تستطع المشاركة بسبب مشكلة في الحصول على تأشيرة دخول في لبنان.

في هذا العمل ، إجابات على أسئلة "لماذا نحن في عصر الثورات النسائية؟" و "لماذا ثورة روج آفا ثورة نسائية؟" أعطيت وقدمت التوصيات في هذا الشأن كاقتراح إلى مؤتمر المرأة العالمي

إحداها إغلاق المجال الجوي لسوريا أمام الطائرات الحربية في موعد يحدده المؤتمر أو في الأول من تشرين الثاني (نوفمبر) في يوم كوباني العالمي / الثاني من تشرين الثاني (نوفمبر) في يوم روج آفا العالمي. ثانيًا ، سيذهب وفد من المؤتمر العالمي للمرأة إلى روجافا لرؤية الوضع هناك ومشاركة دعمهن مع النساء. كما قدمت النساء الكرديات اقتراحات للمحتوى. يمكننا القول أن مندوبي كردستان كانوا مقيدين فقط بأجنداتهم الخاصة.

قدمت النساء الشيوعيات مقترحات مثل تنظيم مجالس الرقابة ، وإصدار مطبوعة ، لتقوية التنظيم الداخلي لمؤتمر المرأة العالمي وتعزيز القانون الداخلي

ونص الاقتراح على أنه يجب اتخاذ قرار اضرب النساء عن العمل في ٨ مارس ٢٠٢٣. ستكون المناقشات التي استمرت لمدة أسبوع مساهمة مهمة لكل من المشاركين والمنظمات.

EM LI MALAN, LI QADÊN AZADIYÊ, DI ŞER DE LI DIJÎ TUNDIYA ZILAMPEREST

TÊKOŞÎNA YEKBÛYÎ Û XWEPARASTINÊ XURT BIKIN

Îro li seranserî cîhanê zayenda jin ji aliyê pergala kapîtalîst a serdestiya zilamperest ve tên perçiqandin, ked û cinsîtiya wan tê mêtîngeh kirin. Amûrê herî girîng ê berdewamkirina vê jî tundî ye. Her çiqasî ku bi rêya şoreşa xwe ya gelxwez, azadîxwez û demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî em li dijî tundiya li ser jinê destkeftinên girîng bi dest bixin jî, di jiyana civakî de tundiya zilamperest weke pirsgêrêkeke girîng hebûna xwe berdewam dike.

Tundiya li dijî jinê; "weke çalakiyên tehdîdkirin, zorlêkirin û li gorî kêfa xwe mehrûm hiştina ji azadiyê ku weke fizîkî, cinsî, psikolojik êş û jan dide jinê" tê şirovekirin. Tundiya li ser jinê, ji newekhevbûna jin û zilam diqewime. Bi tundiya li ser jinê, şkenandina xweparastin, bênirx dîtina xwe û bêhêz dîtina xwe tê armançgirtin.

Di roja me ya îro de jî, di şertên kûrewîbûna emperyaliyeta ku bi serdestiya zilamperest ve derbasî nav hev bûye de tundiya li ser jinê di her milê de zêde bûye. Jin mecbûr e ku jin hem di hundirê malê de erkên xwe yên malê bê kemasî bi cih bîne, lê di heman demê de zor lê tê kirin ku bêtemînat û bi fonên gelekî kêm, di şertên ne baş de bixebitin. Di qadên xebatê de destpêkê de rastî êrîşên cinsî yên karsazan tên.

Heta niha di şeran de, di qadên ku hatine dagirkirin de jin weke qadên ku bên dagirkirin tên dîtin, rastî tacîz û destdirêjiyên bitevayî tên û her cureya tundiyê dijîn. Li Elmanyayê di qampên Nazivan de, li Vîetnamê di zindanên Saygon de, li Arjantîn, Bosnayî, Kurdistan, Iraq, Yewmenîstan, Şengal û Efrînê bi mîlyonan jin rastî destdirêjiyê hatin. Ji pê ve li dijî jinên şoreşger û muxalîf jî êrîşa destdirêjiyê tê sepandin. Destdirêjî rêbazeke weke civakî, cinsî, hîsî û polîtîk radestgirtinê ye.

Kiryarên ku ji aliyê DAÎŞ'ê ve li dijî bi hezaran jinên Êzîdî hatine sepandin û di dilê me de bû kuleke ku derman nebe li ber çavên tevahî cîhanê hat dijîn. Li axên me yên ku hatin dagirkirin, li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî ji aliyê leşger û çeteyên dewleta Tirk ve jin û zarok tên revandin, destdirêjiya bedena wan tê kirin, tên qetilkirin, tên firotin zilaman û bi êrîşên xistina zindanan ve rû bi rû dimînin.

Di pêvajoyên şer û dagirkirine de hem koçberiya hundirîn, hem jî koçberiya derve tê jiyankirin. Jin di aliyekî de li qadên ku ziman û çandê wê derê nizanin weke aborî zahmetî dijîn û rastî her cureya tundiyê tên. Tacîz û destdirêjî tê normalkirin, keçikên temenê wan biçûk li beramberî pere tên zewicandin, bedena wan tê firotin, bi xebitandina şertên zahmet û fonên kêm keda wan tê mêtîngehkirin.

Weke ku li tevahiya cîhanê li Rojhilata Navîn jî jin hem li dijî tundiya zilam, hem jî li dijî tundiya dewletan bê deng namînin û xweparastina xwe pêk tînin. Têkoşîna ku di pêşengtiya jinên Kurd û jinên komûnîst de hatiye dayin li Rojava gîhaştiye asta şoreşa jin û li dijî mêtîngêriya serdestiya zilam bûye berbesteke girîng. Li Tirkivê û Bakurê Kurdistanê jî hem li dijî komkujiyên jin, hem jî li dijî tundiya hikûmeta AKP'ê ya paşverû û faşîst a li ser jinê berxwedaneke jinê ya xurt tê meşandin. Li Şengalê jinên ku gîhaştin zanebûna ku "parastina xwe bi xwe dikarin bikin" rêxistinên xwe pêş xistin û artêşa jin a bi navê Yekîtiya Jinên Şengalê (YJŞ) avakirin. Jinên Îranî û Rojhilatê Kurdistanê jî bi deh salan e li dijî paşverûtiya îslamî ya faşîst a serdestiya zilam di nav têkoşînê de ne. Di demeke nêzik de piştî ku polîsên exlaqê ji bo ku

parçeyek ji porê wê xuya dike Jîna Emînî qetilkirin bi bedêla bedelên mezin jin û zilamên ku azadî dixwazin bi rojan li kolanan têkoşîn kirin û ev têkoşîn hîna berdewam e.

Li Rojava, şoreşa jin çêbûyî û neqediyaye. Têkoşîna navbera jin û zilaman bi hemû tundiya xwe berdewam e. Di zagonên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî de tundiya li dijî jinê sûcên weke herî giran tê jimartin û li gorî vê tê cezakirin. Bi rêxistinên weke asayişên jin, Rêxistina Sara, Meclîsên edaleta jin, Mala Jin jin hatin xurt kirin û li dijî tundiya serdestiya zilam derketin. YPJ'ê di têkçûna DAÎŞ'a hov a dijminê jin de roleke girîng lîst û îro jî li dijî her cure êrîşên zilamperestiya serdest disekine. Li cîhanê jin herî zêde li Rojava xwedî maf in. Lê bi bandora ol, eşîr, kevneşopî, adet û teqelîdan feraseta zilamperest hîna gelekî xurt e û tundiya li ser jinê berdewam e. Têkîliyên kevneşopî yên malbatî îmtiyazên zilam û bindestiya jinê ji nû ve diafirîne. Di rêjeya qetilkirin, destdirêjî û tacîza li ser jinan kêmbûn çêbibe jî tundiya fizîkî, aborî û psikolojik berdewam e.

Em li welat û axên xwe bi hêza ku em ji zagonên jin û rêxistinên jinan digirin, bi mezinkirina piştgiriya jinê ji bo pêşî lê girtina her cure tundiya li ser jinê, weke jin erk bigirin ser milên xwe. Em li dijî tundiya zilamperest hîna bihîzyar bibin û tenê weke pirsgêrêkeke malbatî nenirxînin. Em bi standina piştgiriya rêxistinên eleqadar ji bo dawîbûna tundiyê têkoşîn bikin. Em hem kesayetî, hem jî rêxistinî xweparastina xwe xurt bikin. Em li dijî dagirkeran amadekariya xwe bikin û berxwedana jin mezin bikin. Em bi zanebûna ku dewleta Tirk bi şehîdxistina pêşêngên jin şoreşa me hedef digire tev bigerin. Em li dijî bi rêbazên şerê taybet koçberkirina gelê xwe bisekinin. Em bibin denga hawara jinên ku li qadên dagirkirî yên ber serê me rastî her cure tundiyê tên.

Ger ku li cihekî tundiya li ser jinê hebe ev tê wateya ku ev tundî li dijî me hemûyan tê sepandin. Divê em êşa wê di dilên xwe de hîs bikin. Em li dijî tundiya ku li cihekî cîhanê jî denga xwe bilin bikin û têkoşîna hevbeş a jinan pêş bixin.

Em di roja 25"e Mijdarê roja têkoşîna tundiya li ser jinê de di tevahî qadên ku em tê de ne dirûşmeya "Em ê bi berxwedana jin dagirkerî û tundiyê têk bibin" li kolanan teva girseyên jin bilind bikin.